

ETÎMOLOJIYA PEYVA “DEYN”

Ali Husein Kerim

Deyn çi ye?

Di wateya aborî û hiqûqî de: Pere yan jî tişteki ku dive ji paşê bê dayîn re dibêjin deyn.

Di wateya bêgavîtiyê de: pêwistîbûn, lixwegirtîbûn, binbartîbûn

Anegoreyî hin zimanan “deyn”:

erebî *deyn*, tirkî *dûyûn*¹, farsî *qerz*, *deyn*, kurdî *deyn qerd/z*

Dema ku em li jor dixwînin peyva deyn di her sê zimanên Asya Nêzik de yekser (erebî, farisî, kurdî) tê bi kar înan. Baş e, ev peyv xwedera kîjan zimanî ye?

Etîmologên tirk, ereb, faris heta yê kurdan dibêjin ku xwedera peyva “deyn” zimanê erebî ye. Xwadiyê vê angaşte, sedem û piştrastbûna xwe bi van peyvên jêr diselimînin:

Aramîkî *dîn* ‘hukumdar, qanûn’, Akadkî *dînû* ‘daraz, qanûn’, *dayanû* ‘dadger’²

Dema mirov wate û bereya peyva “**deyn**” hinekî hûrbikolîne rastiya wê ji xweberê derdikeve holê. Bilêvkirina peyva “**deyn**”, di heman demê de kiryara “**dayînê**” jî eşkere dike. Ango behsa mijara tişteki bistînin, lê divê paşê bidin xwadiyê wê yê berê.

Biryara “dayîn tişteki” di heman demê de tê wateya “daraz”, “qanûn” û “dadweriyê” jî. Ji ber ku bi armanca ji paş ve vegerandina tiştan anegoreyî bi qanûn yan jî darazan pêktê. Eger tiştta ku deyn hatiye wergirtin ji paş ve venegere hingê bi daraza dadgehî yan jî civakî ve ji paş ve tê vegerandin.

Her çiqasî peyvên **dîn**, **dînû** di zimanên aramîkî û akadkî de jî hatibin bi kar înan, ev nayê wateya ku jêderka wan peyvên di refa zimanên samiyên e.

Jêderka peyva “deyn” peyva *dō-* : *də-*, herwiha *dō-u-* : *dəu-* : *du-* a Proto-Hînd-Ewropî ye û tê wateya “dayîn” ê.

Mînakên jêr ji bo peytdike ku peyva “deyn” ne ji zimanên erebiye:

¹ Di tirkî de bi tenê wek peyva “duyun: borçlar” tê bikaranîn û ji erebî derbasî li nav zimanê osmanliyan bûye û ji wê demê pê de bi tenê derbarê deynê osmaniyan tê behskirin.

² Akkadian BOT. 916; KLN: 399

PHA *dō-: *dā-, *do-u-: *dau-. *du-³, *ai- ‘dayîn’⁴, Hitt. *dā-*, Toch. *pid dai-* ‘diravdan, pēdan’, Skt. *dā-*⁵, Proto-Īrankî *daH*¹ ‘dayîn’, Avesta kevin *dadē-*, Avesta dereng *dadāiti* Avesta *dā-*, Partkî *dh-*⁶, Sogd. *pr’yd*, Baxterian. *δα-* ‘dayîn’⁷, Farsî *daden*, Hindî *dē, dēna*, Ermenîkî *ta, tal*, Kurdî *da, dan, dayîn, dayiş, day, dahe, he-dayan, pēdan*

ChSl. *dati*, SCr. *dati*, Russ. *dat’*, Pol. *dac*, Boh. *dati*, Lith. *duoti*, Lett. *duot*. Gr. *δώσει* (*dosei*), *δίνουν* (*dinoun*), Lat. *dare*, It. *dare, donāre*, Fr. *donner*, Sp. *dar*, Rom. *da*, Alb. *jap, dhuroj*.

Îr. *do-biur*, Nîr. *tugaim, tabhram*, W. *rhoi, rhoddi*, Br. *rei*.

Goth. *giban*, ON *gefa*, Dan. *give*, Sw. *givs*, OE *giefan*, NE *give*, Du. *geven*, OHG *geban*, NHG *geben*.

Peyva “deyn” ji bilê zimanê kurdî di hin zimanên Hînd-Îranî û Hînd-Ewropî jî heye:

Sanskritî:

<i>bAdhyatA:</i>	bêgavîtî (mecbûriyet)
<i>asImita-deyatA:</i>	berpirsiyariya bê sînOR
<i>sambhAvya deya:</i>	berpirsiyariya mercdarî
<i>deya-unmocana:</i>	vergirtina deynekî

Di zimanên latinîaxêf de peyva “deyn”:

Latinî *debîtum* ‘deyndarê tişteki’, *debere* ‘deyndarî’, fransiya kevin *dette*, ingilizkî *debt* ‘deyn’ hwd.

Belê, diyare resena peyva “deyn” erebî nîne, heta mirov dikare bêje ku farişî jî nîne. Ji ber ku di zimanê farişî de peyva “qerz” zêde tê bi kar înan. Her wiha wisa xuya dike ku peyva “deyn” bi kurdiya resen e û ji ber vê jî di axaftinên kurdî de pir kardar e.

³ J. Pokorny 223-26; Walde-P. 1.814 ff. Ernout-M. 274 ff. Walde-H. 1.360 ff.; LiV 105 ff.

⁴ J. Pokorny 10, 3.

⁵ EWAia I: 713 F.

⁶ Ghilian 78; DMMPP: 137a f.

⁷ Samadi: 137

Bibliografie

A. Ernout & A. Meillet, Dictionnaire Etymologique de la Langue Latine, Paris, 1951.

A. P. Pihan, Dictionnaire Etymologique des Mots de la Langue Francaise Derives de L'Arabe, du Persan ou du Turc, Paris 1866.

A. Walde, Latinisches Etymologisches Worterbuch, (With Avestan and Persian Indices), Heidelberg 1938.

Ali Hussein Kerim, Kürtçenin Etimolojik Sözlüğü, Ar yayınları, İstanbul 2019

G. C. Withworth, Anglo-Indian Dictionary, Kegan Paul, Trench & Co, London 1885.

H. W. Baily, Indo-Scythian Studies (Khotanese Texts - volume VI), Cambridge University Press, 1967.

J. Duchesne-Guillemain, "Etymologies Avestiques", Bulletin of the school of Oriental and African Studies (BSOAS IX:1937-39) pp 861-869, University of London.

J. Pokorny, Indogermanisches Etymologisches Worterbuch, Two volumes, Francke verlag, Bern 1959.

L. M. Devis, Dictionnaire Etymologique des Mots Francais D'Origin Orientale, Oriental Press 1876.

Stuart E. Mann, An Indo-European Comparative Dictionary, Helmut Buske Verlag, Hamburg 1987

W. Henning, "A List of Middle – Persian and Parthian Words", Bulletin of the School of Oriental and African Studies (BSOAS IX:1937-39) pp 79-92, University of London.